taybetmendiya rewş û dîroka kurd li Sûriyê

*** Rêjîma Sûrîyê roj bi roj ber bi rûxandinê ve diçe, hûn pêşeroja rêjîmê çawa dibînin... amadekariyên we ji bo guhertineke ku, li Suriyê çêbibe çi ne?**

Baweriya me li cî ye ku, pêşeroj ne ji rijîma Sûriyê re ye. Lê mirov ne di wê gumanê de ye ku, têkçûn û rûxandina rêjîmê ewqas nêzîk di van mehên bên de ye . Hazirî û amedekariyên parta me di sê warên sereke de lidar û berdewam in :

A- Em dixebitin da ku karibin Tevgera Kurd li Sûriyê bidine ser hev . Di vî warî de, lihevkirin û karê hevpar di navbera Hevbendiya Demokrat a Kurd û Berê Demokrat a Kurd de li Sûriyê, û belgeya nêrîna hevbeş ya ku herdiwan li ser erêkirine, gaveke erênî û li pêşe, bi hêviya ku ev nêrîna he bibe belgeya tevahiya tevgerê .

B- Xebata hevpar û têkiliyên dostaniyê ligel hêz û partiyên Sûrî yên rikebir (Opozisyon) di çerçewa danezanîna Şamê li cî û berdewam e, li seranserî bajar û herêmên Sûriyê komîte û Encûmen hatine û têne avakirin .

C- Karê rojane ya rêxistinên partiyê li seranserî herêmên Kurd li Sûriyê li saz û berfirehtir dibe . Rola rêxistin û kadroyên me di warê civakî, rewşenbîrî, ragihandinî û xwedîderketin li zimanê dê, roj bi roj bêtir cî digre û li ba xelkê Kurd dibe ciyê rêzgirtinê .

*** Hinek kes partiya we tewanbar dikin ku hûn ne aktîv in û xwe ji xebatê didin alî, şexsê we bi vê yekê tewanbar dikin, hûn çi dibêjin?**

Her kes li gor zanîna xwe azad û serbest e çi bêje . Lê, mirov ji bîra neke ku azadî û berpirsiyartî divê ji hevdû cuda nebin . Bi qasî em dizanin û dikarin, siyaset û biryarên partiyê em diparêzin û di ber de dixebitin, da ku mirov karibe rû li rû, li pêş hevalên xwe, li beramber dîrok û pêvajoya pirsa gelê xwe û ya mirovatiyê xwedî rol û helwest be .

*** Li gora we opozîsyona Ereb li Suriyê heya çi radeyê amadeye bi Kurdan re bixebite û mafên Kurdan yên rewa nas bike?**

Piraniya kadro û birêvebirên Opozisyona Ereb li Sûriyê bi salan di zîndan û girtîgehên Sûriyê de, di merc û hoyên zor dijwar û nemirovane de, jiyana xwe borandine . Ew di hejmara xwe de ne hindik in, li seranserî bajar û parêzgehan têne dîtin û di nav xelkê de ciyê rêzgiritinê ne . Parta me bi piraniya wan camêran re, rasterast têkildar e . Ew dikarin guhdarî te bikin, bi ser xwede mijûl bin û biponijin. Ew dadmendiya pirs û hebûna dîrokî a Kurd li Sûriyê li ba wan hêdî hêdî baş ciyê xwe digire, nefret dikin û dibêjin na ji siyaseta şoven û setemkar re ya ku rijîma Be,is di derheqa Kurdan de dajo . Bi rastî û li gor me, em dibînin ku pêwîstiyeke dîrokî ye ku em li gel vê Opozisyona demokrat, mil li mil karê hevbeş bikin û bidomînin . Di pêvajoyeke weha de, em dê di wê hêvî û baweriyê de bin ku

D.R (12)